Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1056 | 12-Nisan-2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
☎ 423165

# Şevçirayên Rojava mûmên wêjeyî ne

Hemze Sêvo/ Qamişlo

**Her sal di meha Remezanê de li navenda HRRK'ê ya bajarê Qamişlo rêzeçalakiyên bi navê Şevçirayên Rojava yên derbarê wêje û zimanê Kurdî de tên li dar xistin. Şevçirayên Îsal jî bi beşdarbûna gelek nivîskar, helbestvan û rewşenbîran birêve diçin.**

Rojava ji bo nivîs û helbesta kurdî pir girîng e. Nivîskar , helbestvan û wêjevan vê çalakiyê ji xwe re weke derfeta pêşketinê dibînin. Herwiha ev bername asta ronakbîrî ya kesên beşdar diyar dike û wan hertim bi wêje û çanda kurdî ve girêdide. Min îsal çîroka xwe ya bi navê Cilê



Belaş û Arzan tevlî vê bernameyê kir û di şevbuhêrkekê de xwend, vê yekê hişt kuhizkirina nivîsê li cem min mezintir bibe, da ku hîn zêdetir pêşkevim. Li gor min bi xwe armanca ku HRRK'ê dixwest bighêje wê, pêk hat."

Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê HRRK`ê, komeleyeke çandî ye, ji bo pêşxistina wêje û zimanê Kurdî xebatên mezin dide meşandin.Herwiha hewl dide ku bibe konekî rewşenbîrî ji ramanên estetîk û afrîneriya hemû rewşembîrên Rojavaê Kurdistanê re.

HRRK`ê ji bo parastin wêjeya kurdî û pêşxistina asta rewşenbîrî li Rojava kar û xebatên bi sûd û giranbuha dimeşîne, yek ji xebatên wê yên domdar jî, çalakiyên Şevçirayên Rojava ye. Ev çalakî di sala 2022'an de yekem car hat lidarxistin. Şevçirayên Rojava di şevên meha Remezanê de li navenda HRRK`ê ya bajarê Qamişlo tên lidarxistin.

Herwiha mijarên ku di van çalakiyan de, tên dayîn cuda û cihêreng in, wekî semînerên diderbarê çand,civak û siyasetê de, herwiha nivîskar û helbestvan di van şevbuhêrkan de beşdar dibin û helbest, pirtûk û semînerên xwe dixwînin, piştre di derbarê wan de, dest bi nîqaşa wan dikin.

Derbarê bernameya Şevçirayên Rojavayê de Nîskar Rojîn Mihemed û nivîskar Alan Ebhllah ku di vê bernameyê de beşdarbûn e, ji me re axivîn.

**'Şevçirayên Rojavayê, xwedî li pênûsa azad derdikeve'**

Rojîn Mihemed da zanîn ku Şevçirayên Rojava ji pêşketina nivîskar û helbestvanên Rojava derfeteke û wiha domand: "Şevçrayên

Rojîn Mihemed derbarê hin pirsgirêkên ku derdikeve pêşiya Şevçirayê û axaftina xwe wiha qedand: "Astengiyên ku derdikevin pêş teknîkî ne, wekî tunebûna weşana zindî, ji ber ku gelek rewşenbîrên Kurd yên li derveyî welat dixwazin van şevbuhêrkan bişopînin, lê nikarin."

**'Berhemên min ji pirsên civakê re bersivin'**

Alan Abdullah jî derbarê çîrokên xwe yên beşdarî berneameya Şevçirayên Rojavav kiriye wiha got: "Ez çîroknivîsim, nû ketime qada nivîsa çîrokê de,heya niha min çar çîrok nivîsandine, di vê bernameyê de min 2 çîrokên xwe xwendine, yek ji wan çîrokan jî ya bi navê Pirs bû, di vê çîrokê de nameyek heye ew name jî bersiv e ji pirsa civaka me re ye;pirsa heyrandina xort li ber hilbijartina dayîk an hevjînê ye. Ev pirs di civaka me de ji wan xortên ku dikevin temenê zewacê de, tê kirin. Tişta ku ez di vê çîrokê de bighînim civakê ew e ku, divê hertim li aliyekî tenê meyze neke. Ev bername weke derfetekê ji hemû kesên rewşenbîr, nivîskar û helbestvanan re vekir û gavên di warê pêşxistina wêjeya kurdî de, avêtin pêş.

# MÎNAKEKE HEVGİRTİNA CİVAKÊ: APÊ EBDULKERÎM

**Apê Ebdulkerîm ji piştî erdhejê ve alîkariya şêniyên Şêxmeqûsd û Eşrefiyê dike.**



Piştî erdheja ku li Tirkiye û Bakurê Kurdistanê rû da û bandor li Sûriyeyê kir, însiyatîfên ku hevgirtina civakê nîşan didin, xurtir bûn. Hevgirtin di asteke mezin de êşên civaka sivik dike û wek bersivekê li hember siyasetên ambargo û diziya alîkariyan e ku pergalên faşîst û nîjadperest dimeşînin.

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi rê û rêbazên cuda însiyatîfên hevgirtinê derketin pêş. Apê Ebdulkerîm Xûlî yê li Helebê jî mînak e.

Apê Ebdulkerîm Xûlî ê 60 salî heta ji dest wî tê alîkariya şêniyan dike û lembeyên kehrebeyê bê pere sererast dike. Apê Ebdulkerîm ev hostetî ji xwendina xwe ya li Peymangeha Elektronikê ya Helebê wergirtiye.

Apê Ebdulkerîm Xûlî ji piştî erdehjê ve rojane dikana xwe vedike û bê pere lembeyên kehrebeyê yên şêniyan sererast dike. Apê Ebdulkerîm anî ziman ku ew dixwaze bi rêbazên xwe yên taybet alîkariyê civakê bike.

Apê Ebdulkerîm dibêje: "Lêçûna sererastkirinê biha ye. Armanca me ne qezenckirina pereyan e, lê piştgiriya civakê di aliyê madî de ye. Piştî ku sererastkirina lembeyên wan diqedînim, dipirsin lêçûna wê çi qas e? Ez dibêjim, bê pere ye. Bi vê yekê kêfxweş dibin. Ez didim nîşandan ku hevgirtin di navbera şêniyan de heye."

Apê Ebdulkerîm bi eslê xwe êzidî ye, ji gundê Birc Ebdalo yê Efrînê ye. Lê ji derdora 45 salan ve li taxa Şêxmeqsûdê ya Helebê dijî. Apê Ebdulkerîm bal kişand ser girîngiya hevgirtina civakan û gelan. Her wiha pesnê hemû însiyatêfên gel da ku şêniyên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê pêk anîn. Di dawiya axaftina xwe de, apê Ebdulkerîm destnîşan kir ku kesên dixwazin xizmeta civakê bikin ne girîng e ku pereyên wan hebin, tenê dikarin bi riya kar û pisporiya xwe destekê bidin civaka xwe.

Sudoku: Bersiv 65

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 6 | 7 | 9 | 5 | 4 | 8 | 2 | 1 | 3 |
| 4 | 1 | 8 | 2 | 6 | 3 | 5 | 9 | 7 |
| 3 | 2 | 5 | 9 | 1 | 7 | 6 | 4 | 8 |
| 7 | 9 | 4 | 8 | 3 | 2 | 1 | 6 | 5 |
| 1 | 5 | 2 | 6 | 7 | 4 | 8 | 3 | 9 |
| 8 | 6 | 3 | 1 | 5 | 9 | 4 | 7 | 2 |
| 9 | 4 | 1 | 7 | 2 | 5 | 3 | 8 | 6 |
| 2 | 3 | 7 | 4 | 8 | 6 | 9 | 5 | 1 |
| 5 | 8 | 6 | 3 | 9 | 1 | 7 | 2 | 4 |

Sudoku:Pirs 66

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | | 7 | | | | 8 | 1 | |
| 8 | | | | | | | | |
| | 6 | 2 | | 4 | 8 | | 9 | |
| 3 | | | 8 | | 5 | | 2 | |
| | | | 4 | 2 | 6 | | | |
| | 2 | | 1 | | 7 | | | 9 |
| | 8 | | 2 | 7 | | 9 | 4 | |
| | | | | | | | | 3 |
| | 4 | 9 | | | | 1 | | 5 |

## Quncika Têgînan

| Bendav | Ji bo komkirina avê, avdan û kehrebeyê benda li ser çemê avê tê çêkirin. Sed |
|---|---|
| Dirav | Pere |
| Girav | Erdê hawîrdorê wî bi avê hatî pêçan. Cezîre. |
| Eger | 1. Ku: Ku tu neyî ez jî naçim. 2. Sedem: Dewletê egera bihakirina benzînê diyar kir. Divê em şehîdan bikin egera xurtkirina têkoşînê. |
| Jineolojî | Zanista jinê |
| Peyman | Lihevkirin |
| Pênase | Danasîn, te´rîf. |
| Piyale | Qedeh, berdaq, istekan, îskan. |
| Sinc | Exlaq. |
| Xwerek | Tiştên hişk yên dibin xwarin, zad. Birinc, nok, nîsk û hwd. |



# Kongra Star: Dayika Uweyş berhemekî bêhempa diyarî gelê Kurd kir

Meclisa Kongra Star diyar kir ku Dayika Uweyş berhemekî bêhempa diyarî gelê Kurd kir û got, perwerde û têkoşîna dayika Uweyş hişt ku têkoşîna jinan zindî bibe û Kurd ji xewa mirinê şiyar bibin.**R-3**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1056 | 12-Nisan-2023 | www.ronahi.net/ku/

# "EM Ê BI PARTIYA ÇEPÊN KESK HESABÊ ERDHEJÊ BIPIRSIN"




## " Bila Iraq dest hilîne"



Piştî êrişa dewleta Tirk a li dijî Balefirgeha Navneteweyî ya Silêmaniyê, hem xelkê Başûrê Kurdistanê û iraqê û hem jî gelek siyasetmedarên Kurd û Iraqê ji hikûmetê dixwazin gavên pêşwîst biavêje.**R-3**

## "Emê riya têkoşerên xwe bişopînin"



Malbatek ji bajarê Qamişlo navê Harûnê ku bi xiyanet radestî dewleta Tirk a dagirker hatibû kirin, li zaroka xwe yê ku nû jidayîk bûye kir. Dayîka Harûnê biçûk diyar kir ku ew ê riya Têkoşerên Kurd bişopînin.**R-6**

## Dayîkên Gerîla: Em ê riya têkoşîna azadiyê bidomînin


R-2

## Êrîşên dewleta Tirk a dagirker roj bi roj zêdetir dibin



Ji bo qirkirina gelê Kurd, dewleta Tirk a dagirker êrîşên xwe yên hovane yên ser tevahiya Kurdistanê didomîne. Dagirkerî li ber cavên cîhanê rojan e çeken kîmyawî jî bikar tîne, lê cîhan bêdeng e.**R-5**

## Rewşa Çandiniyê Li Herêma Cizîrê,bi barîna baranê geş dibe



Rewşa çandiniyê li Herêma Cizîrê ya îsal li gor Hilberîna Riwekî ya Desteya Çandiniya Herêma Cizîrê heya astekê baş e û bi erkê şopandin û alîkariya cotkaran radibe û welatiyê bi navê Hemze Elhiweyrî ku ew jî cotkar e û got;" barîna baranan aramî xist dilê hemû cotkaran."**R-6**

DEWLETA TİRK GEFÊN Lİ SER HERÊMÊ DİDOMÎNE
Zekî Bedran R-5

DILYAR CIZÎRÎ
ERDOGAN LI RIYA HILBIJARTINAN DIGERE! R-4

# Dayîkên Gerîla: Em ê riya têkoşîna azadiyê bidomînin

Dayikên gêrîleyan, piştgirî û sekna xwe ya li gel zarokên xwe destnîşan kirin û diyar kirin ku ewê bi berxwedan û îradeya xurt tola rêheval Harûn hilînin.

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Li herêma Zergûza ya navçeya Hezex a Şirnexa Bakurê Kurdistanê gerîlayê HPG`ê Selîm Adiyaman (Harûn Elbak) ji aliyê komeke kontire (cerdevana) ve hat dorpêçkirin û radestî dewleta Tirk a dagirker hat kirin.
Rêvebera Kongira Star, dayika gerîla Leyla Keleş got: Ya yekem ez bi keça xwe ya ku li çiyayên Kurdistanê, li ber xwe dide gelek serbilind im. Em dayikên gerîla riya zarokên xwe dişopînin, bi rûmet li ber xwe didin û bi rûmet dijîn. Emê li hemberî dagirkerên tirk a faşîşt li ber xwe bidin û axa xwe biparêzin. Em ji dijmin re dibêjin, çi qas hewl bidin ku kurdan tune bikin, her wiha bilê were zanînî ku kurd nayin tunekirin. Li çiyayan bi hezaran şêr hene, axa û rometa me diparêzin. Îxanet û komploya li dijî kurd û kurdisanê ji dirêjiya dîrokê ve tê meşandin. Radestkirina hevalê harûn ji milê çeteyên xwefiroş ji bona dagirkerên tirk mînaka herî ber bi çav a vê xiyanetê ye. Lê ya ku herî dilê me şewitand ew bû, mirovên ku navê kurdîtiyê li xwe dikin û hevalê harûn ji bona wan bi şev û roj kar û xebatê dide meşandin, lê heyf û mixabin wan hevalê harûn radestî dagirkerên tirk kirin.





### `EM Ê TOLA TE HILÎNIN HARÛN`

Leyla axaftina xwe wiha domand: “Em mîna tevgera jin û dayîkên gerîla, bi berxwedanî û îradeyeke xurt, emê li hemberî dewletên dagerker bisekinin û axa bi xwîna şehîdan hatî avdan ji bîr nekin. Kompilo û îxanet, ne tenê li dijî Rêber Abdullah Ocelan tê kirin,



di serî de li dijî gelê Kurd ê ku li ber xwe dide tê meşandin. Rêber APO bi firkir û remanê xwe riya azadî û xelasiyê ji bona gelê kurd û tevahî mirovahiyê daye xêzkirin û ji bona vê yekê pêwîste ku hemû kesên azadîxwaz ji bona azadiya Rêber APO her tim li ser piya be. Leyla keleş wiha dawî li axaftina xwe anî: “Em dayikên gerîla û şehîdan soz didin zarokên xwe yên şehîd û gerîlayên parêzvanên ax û rûmetê. Hezar silav û silav em ji şêrên çiyan re dişînin û emê mil bi mil piştgiriyê bidin wan û emê tola hevalê Harûn hilînin.

### ‘RÎ DIBE BOST, LÊ DIJMIN NABE DOST’

Dayika şehîda gêrîla Fatima Hesen jî got:Ez nizanim gotinên xwe ji ku dest pê bikim, şêrên li çiyayan ku malbat û hezkiriyên xwe li pey xwe hiştin, ji bona azadiya gel xwe feda dikin. pêwîste em jî bi hemû hêza xwe tevlî şoreşa azadiyê bibin û bê navber kar û xebatê bikin.
Fatima wiha berdewam kir: “ her wê berxwedan bi ser bikeve û wê tucarî dijminê gelê kurd û xayînên rû reş nikaribin vîna me bişkînin. Herwha weke ku bav û kalê me jî gotî: “kormê darê nej darê be fena darê nîne”. Ji ber wê yekê, tenê hevgirtina gel û xwedî derketina li fikir û remanê Rêber APO wê me ji bindestî û koletiyê rizgar bike û wê riya azadiyê ji bona me ronî bike.

# NAMZETÊN PARTİYA KESK A ÇEP Jİ SEDÎ 40 JİN İN

**Namzetên parlamenteriyê yên Partiya Kesk a Çep ji sedî 40 jin in. Ev rêje di hilbijartinên parlamentoyê yên Tirkiyeyê de, ya herî bilind e.**

Partiyên siyasî yên Tirkiyeyê lîsteyên xwe yên parlamenterên ji bo di hilbijartinên 14’ê Gulanê de pêşkêşî Desteya Hilbijartinê ya Bilind kirin.
Di lîsteyên Partiya Kesk a Çep de ku li şûna HDP’ê dikeve hilbijartinan, ji 490 namzetan 193 jin in. Her wiha ji 398 namzetên Partiya Karkeran a Tirkiyeyê (TÎP) ya di bin Tifaqa Ked û Azadiyê de cih digire jî 161 namzet jin.
AKP û hevkarê wê MHP ku dema desthilata wan de jin bûne hedef, bûyerên tacîz û tecawizê û cînayetên jinan zêde bûn, jin di lîsteyên namzetan de jî tune hatin hesibandin. Di lîsteya namzetên



parlamenteriyê yên AKP’ê de, bi tenê 113 jinan cih girtin. Di lîsteya namzetan a hevkarê desthilata AKP’ê, MHP’ê de jî tenê 73 jin hene. Di AKP’ê de ji sedî 18 jin namzet hatin nîşandan, di MHP’ê de ev rêje daket ji sedî 12’an.
Di lîsteya ku Partiya Gel a Komarê (CHP) ku partiya herî mezin a opozîsyonê ye, 580 namzetan cih girt. Ji van namzetan tenê 153 jin in anku rêjeya jinan ji sedî 26 e.

# Lİ ÎRANÊ AKTÎVÎSTA KURD GORJ CARA DUYEMÎN HAT GİRTİN

**Aktîvîsta kurd Zîna Madras Gorj ku di roja 4’emîn a xwepêşandanên li Îranê de hatibû girtin û bi kefalete hatibû berdan, carek din hat girtin.**

Jina kurd a aktîvîst Zîna Madras Gorj ku di roja 4’emîn a xwepêşandanên piştî kuştina Jîna Emînî li Îranê dest pê kir de bi îdiaya “avakirina rêxistina hilweşîner” hatibû gir-



tin. Li Girtîgeha Sanandajê dihat ragirtin. Gorj piştî 40 rojan girtî ma bi kefalete hat berdan û doza wê dewam kir. Rjîmê bi îdiayên “li dijî ewlehiya neteweyî lihevkirina veşarî kiriye” û “li dijî rejîmê propaganda dike” Gorj tawanbar kir.

### CARA DUYEMÎN HAT GIRTIN

Li gorî agahiyên hatin bidestxistin, ji bo Gorj piştî hat berdan tev li çalakiyan nebe, gelek caran bi gefên yekîneyên îstîxbaratê re rûbirû maye. Doza Gorj li Dadgeha Sanandajê didomiya her çiqas gazî wê kirine jî lê neçûye dadgehê. Dadgehê derbarê wê de biryara girtinê daye û duh hêzên rejîmê wê girtinê û carek din şandine girtîgehê.



# ZİMANÊ ME NASNAMEYA ME YE

Dema em behsa Zimên dikin . Tê bala me , gelo di layê şêweya zimanê devkî, yanî dema bavikên KURDAN beriya (30 000) sal di KURDISTANÊ û MEZOBOTAMIYA de axivîne ? . yan mebest jê ew e ji dema ku şehristanî û pêre tîp hatine afirandin bi şêweyê nivîskî 3500 sal beriya zayinê ye.

**Biradostê Mîtanî**

Em ê di vî babetê zimanê KURDÎ de,rahêjine mijara tîpên KURDÎ,yanî mijara nivîsandinê,ne ya axaftina bi lêvkirinê yanî ne yê devkî beriya (30 000) sal ?.
Dîroka zimanê kurdî ji layê afirandina tîpan ve dirêj e.Dikeve kûrahiya dema dîroka kurdên GOTÎ de,yên xwedî rola sereke di avakirina şehristaniya Someran de,yên ku dîroknas dibêjin wan tîp afirandine .Ya dema dinivîsandin bi mîxan (Bizmaran) weke ku ew beşek in ji Someriyan, mîna hemû êl û gelên din,ên di kevana zêrîn a Mezobotamiyayê de.




### TÎPÊN ZINDÎ YÊN PIRTÛKA REŞ

Ew tîpên KURDÎ di destpêkê de hatin nîşankirin bi navê tîpên zindî yên tên naskirin bi birayên me yên ÊZDÎ re, yên pê PIRTÛKA REŞ nivîsandibûn û wilo ta bawermendiya kurdan bi xudawendê mîtra( Roj) hat, jê re digotin zimanê mîtrayî. Lê zimanê kurdî bû zimanê fermî di dewleta Mîdî de 728an B.Z, li cem Kurd û Faris û pêkhateyên din.

### TÎPÊN AVİDTSYÎ:

Di dema pêxember Zerdeşt (S) de zimanê kurdî xwertir û belavtir bû, dema pirtûka wî Avista belav bû di Rohilata navîn û Asyayê de, û wilo jê re di cîhanê de digotin zimanê avistayî û tîpên wê hatin bi navkirin bi tîpên AVISTAYÎ yên ku hijmara wan(44 ) tîp bûn. Lê mixabin ew ziman êşiya li ser destê Sikenderê Mekdonî,dema Avista di şewitand.
Piştî ziman û ola zerdeştî qelis bû di dema Sikenderê Meqdûnî de. Mislmantî hate Kurdistanê, ol û zimanê kurdan qelistir bû, ji ber wan ji SIKENDERÊ MEKDONÎ bihtir qirkirin bi serê zimanê KURDÎ de anîn.




### TÎPÊN PÊLEWANÎ:

Di dema Sasaniyên ku koka wan KURD E de, tîpên Pehlewî{Pêlewanî} geş bûn di nav kurdan de. Hijmara wan 42 tîp bûn, mîna zimanên hebûn di cîhanê de, ew jî bûbû yê nivîsandin û Çandê li cem kurdan û “Ehmedê kurê WEHŞIYÊ yê NEBETÎ dibêje: Min (30) pirtûk bi pehlewî dîtin li şamê. Di pirtûka xwe de ya bi navê: bîrîbûna bi evîn bo zanebûna sembolên pênûsê de dibêje: Pirtûkek ji wan li ser çandina dara xurmeyê bû û ya din li ser avdaniya çandiniyê bû. Lê mixabin di dema Emewyan de li ser destê “Ebdil Melikê Mirwanî” Erebkirin bi dijwarî peya bû û yê jê dijwartir “Hecacê kurê SEQEFÎ” bû. Ku nûnerê Emewiyan bû û li Iraqê wî hemû pirtûkên pehlewî şewitandin û ya xirabtir berpirsiyarê dîwanê yê kurd “Zadan MEROX” kuşt û yekî Ereb di cihê wî de danî. Li ser zimanê pehlewî “M. Mehemed Xinêmî HILAL ” zimanzanê misrî dibêje: Zimanê Pehlewî yê kurdên kevnar e û wata wê gotinê yanî zimanê çekdarên mêrxasên kevnar û ew romana HEZAR ŞEV Û ŞEVEK û wilo KELÎLA Û DIMNA cara yekemîn bi wî hatine nivîsandin. (Ev agahî di pirtûka Erebî ,refê yazdehan yê toreyî de di rûpelê 156 de ye, yên rêbazên hikûmeta Sûrî de bû). Piştre tîpên KURDÎ bûn ên bi navê MASÎ SORATÎ .

### TÎPÊN MASÎ SORATÎ

Bi hatina misilmaniyê û arîkariya tîpên pehlewî û Masî soratî di nav zimanê Erebên NÎV GIRAVA EREBÎ de, QUR’ANA PÎROZ hate nivîsandin û beşek ji kurdên me bi wan tîpan nivîsandin li BAŞÛR û ROJHLATÊ KURDISTANÊ bi



navê tîpên SORANÎ . Lê ji ber ku beşê herî mezin ji gelê kurd di BAKURÊ KURDISTANÊ de ye û ew nêzîkî çanda latînî ye, ew bi tîpên LATÎNÎ dinivîsîne , yên ku mîr CELADET BEDIRXAN bi arîkariya rohlatnasê FERENSÎ ROCÊR LISKO afirandine ji (31) tîpî û cara yekemîn 15/5/1932(z) pê kovara Hawarê hat nivîsandin. Lewra ew roj biwe CEJNA ZIMANÊ KURDÎ.

### GİRNGİYA TÎPÊN PÊLEWANÎ:

Dîroka tîpên Kurdî yên resen ê ku îro em ji wan re dibêjin Soranî bihtirî (5000) sal e bi taybet ji dema tîpên me yê Pêlewanî ve yên dîroka wan bihtir zelal dibe û dirûne wek bingih ji tîpên Soranî (Kurdî),Farisî û Erebî re ji bihtir (2000) sal e. Wan miletan ew tîp birin û pê nivîsandin, lê mixabin me gelê Kurd bi gelmperî ser guhên xwe re avêt û me tîpên seydayê Celadet yên beriya (90) salekî kirin bingeh. Me xwe ji rayên xwe û ji gencîna çanda xwe ya kevnar qut kir, lewra me zirarek mezin gihande kesayeta xwe ya netewî. Ji aliyê axaftinê ve Koka zimanê kurdî Arî ye û ew ji malbata Hindo-Ewrupî ye, û çend devok û zaravên wî jî hene.

### Zaravên sereke ev in :

1- kurmanciya jorîn (weke ya me kurdên Rojava ye) 2- kurmanciya jêrîn(Soranî) 3- kurmancikî yanî Dimilkî yanî Zazakî 4- Hewramî 5- Kelhorî 6- Lorî. Hinek zimanzan dibêjin ku Goranî jî zaravekî kurdî ye û ne devok e.
Îro bêtirî /65/melyon kesên kurd li kurdistanê bi vî zimanî daxivin. Lê ew hijmar mestir dibe di cîhanê de. Ji sedemên nejadperestî û stemkariyê, ew zimanê ku xwedê çêkiriye û Rêxistina navnetewî Yonîsko dibêje: Zimanê kurdî yê 28ê ye di nav zimanê cîhanê de û bi zengîniya peyvan ê siyem e di cihanê de. Ew zimanê giring û xwert kete bin siha metirsiyê de, ku were asmîlasyonkirin,yanî helandin. Lê miletê kurd li ber xwe da û xwe û zimanê xwe parast.
Di dawî de zimanê me, nasnameya me ye û dive em di zimanê xwe de bijîn û wî biparêzin. Ji ber ku em weke NETWA KURD pê tên parastin. Lewra ji me tê xwestin ku em bi erkê xwe rabin ji aliyê axaftin û nivîsandina bi zimanê kurdî, di hemû deran de, bi taybet di malên xwe de. Ji ber ew dibistana yekem e û wilo em guh bidin perwerda Fermî di dibistanan de jî, ji bona ku ew hêvî û xewnên salên bûrî bi cih werin û va bi cih tên, ji ber zimanê me pêş dikeve wek xwendin û rêzmanî, mîna zimanên hemû miletan. Lewre divê em bi dilsozî xwe jê re biwestînin. Çimkî va roja azadiya gelê me hat û giya di bin keviran de namîne û nema, ji ber ku perwerdeya me li Rojavayê Kurdistanê û Başûrê Kurdistanê ji R(1) yê seretayî ta zanîngihê bi zimanê Kurdî pêşket. Em bi hêvî ne ku li parçên din jî ew serkeftin pêk were û bi saya tekoşerên me wê li wir jî, ew serkeftin pêk werin .

# Rewşa Çandiniyê Li Herêma Cizîrê,bi barîna baranê geş dibe

Rewşa çandiniyê li Herêma Cizîrê ya îsal li gor Hilberîna Riwekî ya Desteya Çandiniya Herêma Cizîrê heya astekê baş e û bi erkê şopandin û alîkariya cotkaran radibe û welatiyê bi navê Hemze Elhiweyrî ku ew jî cotkar e û got;" barîna baranan aramî xist dilê hemû cotkaran."

**Reşo Qamişlo/Qamişlo**

Çandinî di jiyanê de ji bo berdewamkirina jiyana mirovan jêdereke bingehîn e, herwiha ji bo welatan jî deriyê wergirtina berhemên ji bo kel û pel, tovê ji bo çandiniyê û xurtkirina milê aboriyê ye. Herwiha ji hemû milê jiyanê û bi giştî, çandinî di rêvebirin û dewamkirina pêdiviyên civak û welatan de xwedî roleke pir girîng e.

Li bakur û rojhilatê Sûriyê jî heman tişt e, başbûna rewşa çandiniyê û bidestxistina berhemên çandiniyê ji bo welatiyan û Rêveberiya Xweser xwedî giringiyeke berbiçav e. Herwiha bandorê li rewşa lawirvaniyê dike, ger rewşa çandiniyê ne baş be; bandoreke neyînî li hemû warên jiyanê ya bakur û rojhilatê Sûriyê dike.

Herwiha ji bo zelalkirina rewşa çandiniyê ya Herêma Cizîrê , rêveberê Hilberîna Riwekî ya Herêma Cizîrê Muitez Ehmed û welatiyê bi navê Hemze Elhiweyrî ji me re axivîn.

'Li gor salên dawî rewşa çandiniyê ya îsal gelekî baş e'

Rêveberê Hilberîna Riwêkî da diyarkirin ku îsal rewşa zeviyên avî û bejî baştir e û wiha got: "Ji destpêka sala çandiniyê me li gor plansaziya salê tovê çandiniyê, semad û mazota terektor û jenetorên bîrên avê bi temamî li cotkaran belav kirin, heya meha sibatê metirsî li ser rewşa çandiniyê hebû, çi zeviyên bej an jî yên avî, lê piştî barîna baran di meha adarê de,



rewşa çandiniyê li gor meh û salên borî û heya astekê pir baş bû û tişta ku di vê meha 4`an de tekez dike barîna baranên bi dûv hev



ve ye. Herwiha em dikarin bêjin ku rewşa zeviyan heya astekê li gor salên dawiyê bi giştî baş e, lê zeviyên nêzî sînorê bakurê Kurdistanê rastî nexweşiyekê tên, ev nexweşî ji kêza Reqikê tê. Ev kêz bêtir li deverên çiyayî dimînin , dewleta Tirk, bi mebest dermanê ku dihêle ev kêzik ji ber bireve, li zeviyên nêzî çiyayê Bagokê dike û ev kêz neçar ber bi herêmê me ve tê û nexweşiyekê li zeviyên welatiyan dixe û bandoreke neyînî li rêjeya hilberîn û berhemdana zeviyan dike. Rêveberiya Xweser ji bo vê yekê jî komîteyek ji bo şopandin û dermankirina zeviyan erkdar kir, ev komîte rewşa zeviyan û nexweşiyê dişopîne ,heger metirsî li ser wan hebe, ev komîte bi erkê xwe radibe û zeviyan derman dike, herwiha hêjayî gotinê ye ku Rêveberiya Xweser barê mesrûfa vî dermanî hildigre ser milê xwe û pê radibe."

'Komîteya Awarte tedbîran ji bo pirsgirêka şewata zeviyan digire'

Muitez Ehmed di berdewamiya axaftinê xwe de bal kişand li ser amadeyên Komîteya Awarte û wiha domand: " Weke çareserî ji bo pirsgirêka agir ya ku bandoreke neyînî li zeviyan di dema çinînê de çêdike, Rêveberiya Xweser ji bo vê yekê komîteyeke Awarte li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê amade kiriye.

Ev komîte gelek agirkujên mezin terixandine, wê ev agirkuj bi şev û roj di xizmetê de bin û herwiha divê agirkujên biçûk ji bo rewşên awarte di deraseyan de jî hebin. Herwiha wê numareyên telefonan yên taybet ji bo van agirkujan hebin û wê ev numare bigihêjin ber destê hemû kesî, ger pêşberî cotkaran rewşên agir derkevin, bi riya van numareyan re ew bi agurkûjan re têkildar bin."

'Ji bo mewsima havînî hertim amadeyî hene'

Rêveberê Hilberîna Riwekî ya Herêma Cizîrê Muitez Ehmed di dawiya axaftinê xwe de zanî ku cotkaran dest bi çandina hemû cûreyên şînî yên havînî kirine û ev tişt anî ziman:" Cotkarên ku bîrên wan hene îsal weke her sal , dest bi çandina pembû, bacanên sor û reş, xiyar, zebeş û hwd… kir, di heman demê de jî em gav bi gav rewşê dişopînin, niha jî em mazot ji bo jeneratorên bîran jî belav dikin, herwiha semad û dermanên pêwîst ji cotkaran re pêşkêş dikin. Ji aliyê din ve jî me ji bo amadehiyên mewsima havînî tu biryar ji bo çinîna zeviyan û deraseyan nedane,lê wê di demeke pêş de were diyarkirin."

'barîna baranan aramî xist dilê cotkaran'

Di derbarê rewşa çandiniyê de



welatiyê bi navê Hemza Elhuweyrî ku yek ji cotkarên gundê Er`ûr yê girêdayî navçeya Rimêlan ya kantona Qamişlo ye, diyar kir ku rewşa zeviyan di dema niha de heya astekê baş e û wiha destnîşan kir:" Destpêka sala çandiniyê payîzxêr neket, lewma bandoreke nebaş li hemû zeviyên herêma bakur û rojhilatê Sûriyê kir. Li hember vê yekê rewşa zeviyên avî jî baş bûn, Rêveberiyê hemû pêdiviyên pêwîst yên çandiniyê ji cotkaran re pêşkêş kirin. Di heman demê de zeviyên bej di xeteriyekê de bûn. Ev yek heya destpêka buharê berdewam kir, baran di destpêka adarê de, li herêma me bariya, lê dereng hat. Hêviya me bi Xwedê hebû, lewma Xweda baran barand û aramî li me vegerand. Di dema niha de heger barîna baranê bidome wê zeviyên bej jî xwe bigihînin. Me her cotkarek bi 10`ê çiwalên genim,ceh,nîsk û hwd… çandine, herwiha ji bo havînê jî rûberên berfireh ji şînahî çandine weke pembû,bacan,pîvaz, bamiya û hwd… çandine û ji bo firotina wê hertim berê xwe didin Rêveberiya Xweser û Rêveberî jî bi bihayekî guncav ji me dikire."

# "Emê riya têkoşerên xwe bişopînin"

**Navenda nûçeyan**

**Malbatek ji bajarê Qamişlo navê Harûnê ku bi xiyanet radestî dewleta Tirk a dagirker hatibû kirin, li zaroka xwe yê ku nû jidayîk bûye kir. Dayîka Harûnê biçûk diyar kir ku ew ê riya Têkoşerên Kurd bişopînin.**

Li herêma Zergûza ya navçeya Hezex a Şirnexa Bakurê Kurdistanê gerîlayê HPG`ê Selîm Adiyaman (Harûn Elbak) ji aliyê komeke kontrayan (cerdevan) ve hat dorpêçkirin û radestî dewleta Tirk a dagirker hat kirin.

Li hemberî xiyaneta ku li Harûn hatiye kirin, gelê kurd li tevahiya Kurdistanê û li derveyî welat jî, bi hêrs bû û bi çalakiyên cûda xiyaneta ku hatiye kirin şermezar kirin.

Li aliyekî din jî, malbatek ji bajarê Qamişlo navê Harûn li pitikêkî ku di roja dîlgirtina Harûn de jidayîk



bûye , kir.

Derbarê xiyaneta ku li Harûn bûye û rakirina navê harûn, dayîka Fatima Elelî ku navê Harûn li zarokê xwe kiriye ji me re axivî û wiha got: "Min di çavên zaroka xwe yê ku nû hatiya duniyayê, Harûn dît. Her kesayetek wateyê dide navê xwe, ne nav rûmetê dide mirov. Heval Harûn jî bi têkoşîna xwe û wêrekiya xwe wate da navê xwe. Heval Harûn û hevalên xwe ji bo parastina aramiya gelê xwe berxwedanî dikirin, lê mixabin kurdên xwefiroş wî radestî dewleta Tirk a faşîst hat kirin."

Fatima derbarê radestkirina Harûn ji dewleta Tirk a dagirkere wiha axivî: "Dîmenê girtina Harûn û radestkirina wî ji dewleta Tirk a dagirker e, dema ku li ser medyayên civakî belav bû, dilê hemî dayîkan



şewtand, lê belê çawa dayîka wî dikare ev îxaneta ku lê hatiye kirin, tehemul bike. Ji ber ku zarok parçek ji canê dayîka xwe ne, em nikarin dest ji wan berdin û tişta herî zor û xerabtir, ew e ku bi destê birayê xwe yê kurd were xeniqandin, divê ew dest bê jêkirin. Em ê tu carî nehêlin ku dagirkeriya Tirk îradeya kurdan bişkîne. Bi dehan têkoşerên me şehîd bûn û hatin dîlgirtin, lê meşa azadiyê dewam kir."

Fatima axavtina xwe wiha bi dawî kir û got:"Her dem kurdên xayîn ji dagirkeran re dibin destek, Harûn ne kesê yekeme yê ku bi destê xayinan radestî dagirkeriya dewleta Tirk hatiye kirin û ew ê nabe dawîn jî. Her wiha kurd tu carî tune nabin, me navê Mezlûm, Egîd, Bêrîtan û Viyan li dehan zarokên xwe kirin û me riya şopand. Herwiha emê li bi dehan Harûnan jî ji bû azadiya gelê Kurd bidin."



# " BİLA IRAQ DEST HİLÎNE! "

**Navenda nûçeyan**

**Piştî êrişa dewleta Tirk a li dijî Balefirgeha Navneteweyî ya Silêmaniyê, hem xelkê Başûrê Kurdistanê û iraqê û hem jî gelek siyasetmedarên Kurd û Iraqê ji hikûmetê dixwazin gavên pêşwîst biavêje.**

Piştî êrişa 7´ê Nîsana bihurî ya li nêzî balefirgeha Silêmaniyê, li gelek bajarên Başûrê Kurdistanê xwepêşandn hatin lidarxistin. Xwepêşandanan doh jî dewam kir. Li Wargeha penaberan a li Mexmûrê welatiyan êrişa dewleta Tirk rûreş kir. Wekî din şandeyeke Bexdayê çû Silêmaniyê ji bo hevdîtin û lêkolînan. Parlamenterê Hevpeymana Dewleta Yasa, Arif Hemam jî ji Iraqê xwest giliyê dewleta Tirk bike. Lê pirsa sereke ya piştî vê êrişa li dijî balefirgeheke seferên sivîl, ew e, ka gelo dewleta iraqê wê di warê qanûnî de dest hilîne yan na.

Xwendekarên dibistanan û xelkê Wargeha Penaberan a Şehîd Rus-



tem Cûdî (Mexmûr) êrişa ji aliyê balefirên bê mirov ên dewleta dagirker a Tirk ve li ser balefirxaneya navneteweyî ya Silêmaniyê, bi tundî şermezar kir. Xwepêşandanan bi daxuyaniyekê êriş şermezar kir.

Xwendekar û şêniyên wargehê beriya daxuyaniyê bidin, rêz girtin ji bo tevahî şehîdên şoreşa Kurdistanê. Endamê rêveberiya dibistana amadeyî ya Şehîd Koçerîn Mamoste Mistefa Ergen daxuyanî da.

Mamoste Mistefa Ergen destpêkê êrişa 7'ê Nîsanê ya li dijî balefirxaneya Silêmaniyê şermezar kir û got, "Dema em temaşe dikin li kîjan welat, bajar û parçe dibe bila bibe, her tim pêşengên Kurd, kesayetên ku ji bo standina mafên mirovahiyê hemûyî ked dane, berdêl dane û canê xwe bexşandine, bûne hedefa êrişan. Dîsa pêşengên Gelê Kurd yên li Rojava ku li gel berpirsên YNK'ê dema ji bo karekî kom bûbûn li wir êrişek li dijî wan pêk hat. Rejîma faşîst AKP û MHP´ê, her wiha xiyanetkarên Kurd yên di nava Kurdan de armanceke wan ew e ku kesayetên dengê Kurdayetiyê bilind dikin, kesayetên ku li rûmeta mirovatiyê xwedî derdikevin, bikin armanc. Em jî weke hemû xwendekar, mamoste û tevahiya xelkê wargehê bang li raya giştî dikin da ku li erkên xwe yên mirovbûnê xwedî derkevin."

**Heyet wê raporê bide parlamenê**

Li aliyê din şandeke parlamena Iraqê li Silêmaniyê serdana cihê êrişa li dijî balafirxaneya Silêmaniyê kir. Şandeya parlamena Iraqê bi serokatiya serokê Lijneya Asayîş û Parastinê ya parlamenê Ebas Sebrî çû Silêmaniyê. Parlamenterên Iraqê Karwan Yarweys û Kemal Axa ên ser bi fraksiyona YNK'ê ve şandeya parlamenê pêşwazî kir. Şande çû serdana balafirxaneya Silêmaniyê û li cihê êrişê lêkolîn kirin. Li gorî agahiyan şande piştî lêkolînên xwe wê derbarê êrişê de raporekê amade bike û pêşkêşî parlamena Iraqê bike.

**Divê Iraq giliyê Tirkiyê bike**

Parlamenterê Hevpeymana Dewleta Yasa, Arif Hemamî jî got, Tirkiye gelekî ketiye nava xaka Iraqê û herî dawî jî êrişî balafirxaneya Silêmaniyê kiriye. Arif bang li Hikumeta Iraqê kir da ku li ser asta navneteweyî, giliyê Tirkiyeyê bike.

Arif Hemamî ji Rojnewsê re axivî û got, dewleta Tirk gelek ketiye nav xaka Iraqê û hertim êrişên asmanî dike.

Arif êrişa dawî ya dewleta Tirk a li dijî balafirxaneya Silêmaniyê bi bîr xist û xwest ku Hikûmeta Iraqê dijî van êrişan gavan bavêje.

Arif di dawiyê de bang li Hikûmeta Iraqê kir da ku li dijî êrişên Tirkiyeyê li meqam û dadgehên navneteweyî giliyê Tirkiyeyê bike.

# Kongra Star: Dayika Uweyş berhemekî bêhempa diyarî gelê Kurd kir

**Navenda nûçeyan**

**Meclisa Kongra Star diyar kir ku Dayika Uweyş berhemekî bêhempa diyarî gelê Kurd kir û got, perwerde û têkoşîna dayika Uweyş hişt ku têkoşîna jinan zindî bibe û Kurd ji xewa mirinê şiyar bibin.**

Meclisa Kongra Star bi wesîleya salvegera wefata dayika Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan Uweyş daxuyaniyek nivîskî weşand.

Kongra Star di daxuyaniya xwe de wiha got: "Rêber Abdullah Ocalan ji bo dayika xwe dibêje, "Ew tam tufaneke serihildêriyê bû û dizanim ku dayika min têkoşerek mezin e. Di temenê biçûk de têkoşîn fêrî min kir. Hîn jî bandora wê li ser min heye. Dayika min hestek wiha bi min re afirand. Tu xwe bispêrî min, piştgirî û alîkarî ji min bigirî, wisa bi girîn û gazin nikarî bijî. Divê teqez tu bi xwe bersiv bidî. Ev yek dibe sedema hestê xwegihîştin û tolhildanê. Li gund bi serhildêriya xwe dihat nasîn. Li hember kesî serî neditewand. Jin, mêr ferq nedikir, bi ser de diçû, hesab dipirsî. Ji xwe ji ber bandora dayika xwe ez wiha nêzî têkoşîna jinan bûm."

Fatma Ocalan jî dibêje, "Diya min li ber neheqiyê serî neditewand, mêvanperwerbû û gelekê dihat hezkirin."

Kongra Star da xuyakirin ku Dayîka Uweyş dibistana destpêkê bû û wih got: "Belê Dayika Netewî Da-



yika Uweyş berhemekî bêhempa diyariya gelê Kurd kir, perwerde û têkoşîna dayika Uweyş hişt ku têkoşîna jinan zindî bibe û Kurd ji xewa mirinê şiyar bibin. Rêya azadiyê nîşanî jinan kir. Dayika Uweyş dibistana destpêkê bû ku Rêberekî wekî Rêber Apo ji bo cîhanê bûyî roj û ronahiyê belav dike û azadiya jin asas digire. Li ser esasê vê fikir û ramanên Rêberê Rêberan Rêber Apo, îro bi hezaran jin li serê çiyên Kurdistanê, li warê xwedewandan, ji bo nûjenkirina eşqa Mem û Zîn, Edûlê û Derwêşê Evdî, Xecê û Siyabend têdikoşin. Di encama vê felsefeye de îro li cîhanê bi milyonan mirov li ser felsefeya 'Jin Jiyan Azadî' têdikoşin. Ev hemû bingeha xwe ji perwerdeya rast, kesayeta serhildêr a dayika Uveyş digire"

Meclisa Kongra Star daxuyaniya xwe wiha qedand: "Bi vê boneye em bejna xwe li ber bîranîna Dayika Uweyş, Dayika Netewî ditewînin, hemû dayikên şehîdan û jinên têkoşer, di salvegera wefata Dayika Netewî Dayika Uweyş de bi bîr tînîn û dibêjin bila ruhê wê şad be."


# Lİ ÛRMİYEYÊ ÊRİŞA Bİ GAZÊ: 5 ZAROK RAKİRİN NEXWEŞXANEYÊ

**Navenda nûçeyan**

**Li Ûrmiyeyê li dijî dibistana zarokên keç êrişa jehrî ya gazê pêk hat û 5 xwendekarên ku jehrî bûn rakirin nexweşxaneyê.**

Li Îranê û Rojhilatê Kurdistanê li dijî xwendekarên keç êrişên jehrî didomin. Ji meha mijdara bihûrî heta niha li 26 dibistanan ji hezar xwendekarî zêdetir zarok jehrî bûn. Xelkê herêmê difikire ku ji bo dibistanên zarokên keç bê girtin ev êriş tê kirin. Wezareta Karên Navxweyî daxuyanî da û wiha got: "Ev êriş ji aliyê kesên bi pereyan ji aliyê hêzên derve ve wezîfedarkirin, ji bo şerê derûnî bikin û mirovan bi panîkan bikin, tên kirin."

**LI ÛRMIYE 5 XWENDEKAR JEHRÎ BÛN**



Vê carê jî kesên nasnameya wan nediyar li dijî Dibistana Keçan a Bahman a li Ûrmiyeyê êrişa bi gaza jehrî pêk anîn û di êrişê de 5 xwendekarên keç jehrî bûn û rakirin nexweşxaneyê.

# Endamê Rêveberiya YNK'ê: Hikumet tenê ya Mesrûr Barzanî û Saziya Parastinê ye

**Navenda nûçeyan**

**Endamê Rêveberiya YNK'ê Bêstûn Saburwayî diyarkir ku Hikumet tenê ya Mesrûr Barzanî û Saziya Parastinê ye. Bêstûn dibêje; "Divê hikumetek Herêma Kurdistanê ji bo**



**hemû xelkê were avakirin."**

Dewleta Tirk a dagirker bê navber li Herêma Kurdistan û ser xaka Iraqê sivîl û pêşengên gelê Kurd dike hedef. Herî dawî balafirxaneya Silêmaniyê kir hedef.

Endamê Rêveberiya YNK'ê Bêstûn Saburwayî derbarê êrişê de li ser malpera xwe ya tora civkî nivîsek parvekir.

Bêstûn di nivîsa xwe de dibêje; "Hikumeta Kak Mesrûr Barzanî tenê hikumeta wî û ya Saziya Parastinê ye. Divê bê cesaretiya me hemû biçe û hikumetek Herêma Kurdistanê ya ji bo hemû xelkê were avakirin."

# "EM Ê Bİ PARTİYA ÇEPÊN KESK HESABÊ ERDHEJÊ BİPİRSİN"

## Li Meletiyê mexdûrên erdhejê destnîşan kirin ku sedema karesata çêbûye desthilata AKP-MHP'ê ye û gotin ku dê di hilbijartinên 14'ê Gulanê de bi Partiya Çepên Kesk hesab ji desthilatê bipirsin.

Partiya Çepên Kesk li bajar, navçe û bajarokan bi vekirina buroyên hilbijartinê xebatên xwe bênavber didomîne. Partiya Çepên Kesk, di 10'ê nîsanê de li Meletiyê ku bandoreke mezin ji erdhejên Mereşê girtibû, buroya hilbijartinê vekir. Gelek welatî tev li vekirina buroyê bûn û wekî mîtîngekê bi çoşeke mezin vekirina buroyê pîroz kirin.
Ji mexdûrên erdhejê Suleyman Yucekaya û Mehmet Unal ku tev li vekirina buroyê ya Partiya Çepên Kesk bûn, bi lêv kirin ku ew ê di hilbijartinê de bi Partiya Çepên Kesk hesabê erdhejê ji desthilata AKP-MHP'ê bipirsin.
Mexdûrê erdhejê Suleyman Yucekaya anî ziman ku xaniyên ji ber erdhejê xesar dîtine û ev tişt gotin: "Mala me ya bajêr di erdhejê de pir xesar dît. Ji ber wê em jî çûn gund, lê dema em li gund bûn erdheja 2'yan çêbû û di vê erdhejê de xaniyê me yê gund jî xesar dît. Niha hem xaniyê me yê bajêr hem jî yê gund pir xesar dîtine. Gelek xizm û nasên me jî ji ber erdhejê jiyana xwe ji dest dan."



### 'ME BI XWE CENAZEYÊN XWE RAKIRIN'

Yucekaya destnîşan kir ku piştî erdhejê 4 rojan dewletê tu alîakrî ji wan re neşandiye û wiha pê dê çû: "Alîkarî tune bû, ceyran jî hat birîn. Çend rojan av tune bû. Me berf dida ser êgir û wiha avê peyde dikir. Zivistan bû, sar bû lê tu alîkarî tune bû. Gelê me ji Silopiya û ji gelek derên din hat û alîkariya me kir. Me bi derfetên xwe cenazeyên xwe rakirin, tu kesî li halê me nepirsî."

### 'EM Ê HESAB BIPIRSIN'

Yucekaya bi lêv kir ku sedemeke mezin a vê karesatê desthilata AKP-MHP'ê ye û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Em dixwazin gelê Meletiyê hesabe vê yekê di hilbijartinê de bipirse. 22 sal in desthilat in. Hemû şaredariyên bajêr di destê wan de ne. Cihên ku xanî lê çenabin, dan ber îmarê. Ew îmar ji welatiyan re bû goristan. Em ê di hilbijartina 14'ê Gulanê de bi Partiya Çepên Kesk hesabe erdhejê bipirsin."

### 'JI BIN KAVILAN DE DENG DIHAT LÊ ALÎKARÎ TUNE BÛ'

Mexdûrê erdhejê Mehmet Unal jî diyar kir ku di erdhejê de ew li navçeya Çêlikan a Semsûrê bûne û wiha axivî: "Malbata min li navçeya Çêlikanê bû, 2 xaniyên me li wir xirab bûn. Ji malbata min tiştek bi kesî nehat, lê 72 xizm û nasên me jiyana xwe ji dest dan. Heta 10 rojan tu alîkariya dewletê ji me re nehat. Piştî çend rojan gel ji Girê Sor û derdorê hat alikariya me kir. Ji ber ku dewletê karê xwe nekir, ew qas kesan jiyana xwe ji dest da. Sedema vê karesatê dewlet e. Destûr dan ku mirov di xaniyên xirabe de rûnên û niha ew xanî tev hatine xwarê. Piştî erdhejê jî dereng hatin. Ji bin kavilan dengê mirovan dihat, lê kesekî ku alîkariyê bike tune bû."

### 'YA KU HESAB BIPIRSÊ PARTIYA ÇEPÊN KESK E'

Unal di dawiya axaftina xwe de anî ziman ku ew ê di hilbijartinê de hesabê erdhejê bipirsin û wiha got: "Niha em li gel dinêrin êdî hemû ji AKP bêzar bûne. Êdî gel jî aciz bûye û ji bo hilbijartinê amade ye. Partiya ku hesabê erdhejê ji desthilata AKP-MHP'ê bipirse, Partiya Çepên Kesk e. Ji bilî Partiya Çepên Kesk jî tu kes nikare hesab bipirse."

# PİSPORÊN EREB: HEDEFGİRTİNA BALAFİRGEHA SİLÊMANİYÊ SÛCEKÎ TERORÊ YE

**Pisporên Ereb destnîşan kir ku êrişa dewleta Tirk a dagirker a li dijî balafirgeha Silêmaniyê binpêkirineke din a dewleta Tirk e. Pisporan bêdengiya cîhana erebî ya li hember sûcên dewleta Tirk şermezar kir û bang li hikumetên Ereban kir ku xwedî helwesteke cidî bin.**

Êvara înê (7`ê Nîsanê) dewleta Tirk a dagirker êrişî Balafirgeha Navneteweyî ya Silêmaniyê kir.



Nivîskar û dîroknasê ji Misirê Elî Ebûlxêr ku ji ajansa me re axivî, diyar kir ku êrişa hewayî ya dewleta Tirk li dijî balafirgeha Silêmaniyê, binpêkirina qanûnên navneteweyî, exlaqî û mirovî ye û wekî binpêkirina serweriya dewletê bi nav kir.
Ebûlxêr got: "Ya xirabtir ew e ku êrişa Tirkiyeyê ya li dijî balafirgehê ji bo hedefgirtina fermandarê Hêzên Sûriya Demokratîk Mezlûm Ebdî bû, lê belê ji ber sedemên derveyî niyetên Tirkiyeyê ew êriş bi bin ket. Hewldana kuştinê girêdayî rewşa hundirîn a Tirkiyeyê ye. Erdogan beriya hilbijartinên serokkomariyê dixwaze xwe li hemberî Tirkan xurt nîşan bide."
Li gorî Ebûlxêr, binkeftina êrişê dê bandoreke mezin li siyaseta Tirkiyeyê û siberoja siyasî ya Erdogan bike.

### BÊDENGIYA CÎHANA EREBÎ

Ebûlxêr destnîşan kir ku bêdengiya cîhana erebî ne nû ye û wiha dom kir: "Ev bêdengî yek ji sedemên zilma dîrokî ya li ser gelê Kurd e. Hemû hikumetên Iraqê rûberên axa Iraqê dan Tirkiyeyê, ji ber wê yekê bi bihaneyên bêbingeh Tirkiye Iraqê wek qadekê ji bo êrişên li ser Kurdan bi kar tîne."
Ebûlxêr, Komkara Erebî jî rexne kir û destnîşan kir ku ew li hember binpêkirinên dewleta Tirk li welatên Ereban û hewldanên kuştina rêveberên Kurdan, deng dernaxe û wiha domand: "Komkara Erebî bi halê xwe yê heyî lawaz e û nikare li hember kirinên Tirkiye û Îsraîlê yên li dijî dewletên Ereban bisekine. Em dikarin bêjin Komkara Erebî û hin sîstem îradeya wan ne di destê wan de ye."
Dîroknasê misirî gelê Kurd silav kir û diyar kir ku gelê Kurd terorê û êrişan qebûl nake, lewma jî çi qas şer dirêj bike jî serkefitn dê para wî be.

### RÛYÊ RAST Ê TIRKIYEYÊ

Hiqûqnas û serokê Rêxistina Mafên Mirovan a Misirî-Erebî Usama Şems jî diyar kir ku êrişa li dijî balafirgeha Silêmaniyê û hewldana kuştina general Mezlûm Ebdî, teror û îdeolojiya dewleta Tirk eşkere kir.
Şems bi bîr xist ku hewldana kuştina fermandarê QSD`ê ew hêza ku dewleta DAIŞ`ê têk bir, rûyê rast ê rejîma Tirk a hewl dide tola DAIŞ`ê ji QSD`ê hilîne, nîşan dide.

### TÊKİLİYA TIRKIYÊ Û DEWLETÊN EREBAN

Hiqûqnas Şems anî ziman ku kiryar û binpêkirina serweriya Sûriye û Iraqê ji aliyê dewleta Tirk ve, biçûkxistina hemû dewletên Ereban e.
Şems,vegerandina têkiliyên dîplomatîk ên welatên Ereban û Tirkiyeyê û pêşwazîkirina rayedarên Tirkan li paytextên Ereban rexne kir û bi bîr xist ku artêşa Tirk hîna serweriya Iraqê binpê dike, herêmên berfireh ji Sûriyeyê dagir dike û hewldanên gihîştina çareseriya aştiyane li Lîbyayê asteng dike.
Hiqûqnasê misirî anî ziman ku êrişa li Silêmaniyê sûcekî terorê ye û got: "Serkêşê rejîma Tirkiyeyê ev sûc kir ji bo ku tundraw û neteweperestên Tirk di hilbijartinan de dengê xwe bidin wî. Rejîmeke ku kuştin û terorê ji bo bidestxistina dengan bi kar tîne, gelekî ku dengê xwe bide rejîma kujer jî, tu xêr tê de nîn e."



### ERDOGAN LI RIYA HILBIJARTINAN DIGERE!

**DILYAR CIZÎRÎ**

Dewleta Tirk a dagirker di 17'ê nîsana 2022'an bi hemû cûreyên çekên pêşketî yên NATO û bi hevkariya çekdarên PDK'ê êrîşî herêmên Metîna, Zap û Avaşînê kir. Di êrişên hîn jî dewam dikin de bi hezaran car çekên kîmyawî û cûreyên din ên qedexikirî bikar anîn. Lê di encama berxwedana bê hempa ya gêrîlayên azadiyê de hemû êrîş hatin têkbirin û artêşa Tirk neçar ma hêzên xwe ji gelek herêman vekşîne.
Balkêş bû ku di dema êrîşê de Erdogan û artêşa wî îda dikirin wê di demeke kurt de herêmên ku êrîşê wan kirine dagir bikin û qadên gêrîla dorpêç bikin. Erdoxan wiha bawer dikir wê di qadên gêrîla de tevgera azadiyê tasfiye bike û bi vê serkeftinê biçe hilbijartinê. Gêrîla bi berxwedana xwe ew plan têk bir.
Hemwextî êrîşan tecrîda girankirî ya li dijî Rêber APO dewam dike. Ev zêdeyî 2 sal in bi tu awayî agahî ji Imralî nayê girtin.
Êrîşên wan ên li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî dewam dikin û ya herî dijwar jî şeva 20'ê mijdara 2022'an bû. Di ecamê de bi balafirên şer binesaziya herêmê bi dijwarî hate bombebarankirin. Rojnamevan jî di nav de gelek welatiyên sivîl şehîd û birîndar bûn. Lê ji ber amedekariya QSD'ê Erdogan di vir de jî riya hilbijartinan venekir.
Ev rewş heta erdheja 6'ê sibatê dewam kir. Bi erhejê re çavên her kesî guhertî ser rewşa mirovî û bobelata bi serê gelê Bakurê Kurdistan, Tirkiyê û Sûriyê hatiye. Her kesî hêvî dikir, dewleta Tirk êrîşên xwe rawestîne. Lê hîn bi hezaran insan di binê kavilan de bûn, êrîşên dewleta Tirk li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê û li Başûrê Kurdistanê dewam dikin. Her çendî êrîş dijwar bûn jî destkeftiya lê digeriyan bi dest nexistin.
Niha û bi nêzîkbûna dema hilbijartinên li Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê ku tê payîn di 14'ê gulanê de werine lidarxistin, gera dewleta Tirk a li wê destkeftiyê bi rê û rêbazên cûda dewam dike. Ji ber wê yekê vir de wir de xwe davêje Rûsiya da wan û hikûmeta Şamê lihev bîne û wiha zemîna êrîşkirinek berfireh li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê beriya hilbijartinan bi dest bixe.
Li aliyê din jî êrîşa li balafirgeha Silêmaniyê ya Başûrê Kurdistanê di çarçoveya hewldanên wan a destxistina serkeftina behsa mijarê ye. wiha hêvî dikirin ewê karibin di kesayeta rayedarên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de destkeftiyên xwe yên ji bo hilbijartinan bi dest bixin.
Berûvajî bi êrîşa li dijî silêmaniyê hestê gelê kurd ê yekîtiya Netewî hîn bi hêztir kir. Ev jî di mesa girseyî ya li Silêmaniyê li dijî êrîşa dewleta Tirk lidarxistî de baş hate dîtin. Niha jî rayedarên dewleta Tirk dixwazin êrîşa niha û êrîşên berê yên li dijî Silêmaniyê rewa nîşan bidin. JI ber wê jî Çavuşoglu îda kir PKK û PYD li Silêmaniyê her derê kontrol dikin. Ev jî careke din têkçûyîn û iflasa wan nîşan dide.
Ji ber wê jî nêrîna min wê têkçiwînên wan heta piştî 14'ê gulanê jî dewam bike.



# Êrîşên dewleta Tirk a dagirker roj bi roj zêdetir dibin

## Ji bo qirkirina gelê Kurd, dewleta Tirk a dagirker êrîşên xwe yên hovane yên ser tevahiya Kurdistanê didomîne. Dagirkerî li ber cavên cîhanê rojan e çeken kîmyawî jî bikar tîne, lê cîhan bêdeng e.

**Navenda nûçeyan**

Bi amanca şikandina vîna gelê Kurd û têkbirina projeya Neteweya Demokratîk, dewleta tirkî ya dagîrker êrişên xwe yên ser Rojava , Qadên Berxwedanê yên Gerîlayên Azadiyê, Wargeha Ş. Rustem Cûdî û Şingalê bênavber didomîne.
Di nava bêdengiya cîhanê de, artêşa Tirk a dagirker êrşên xwe yên ser tevahiya Kurdistanê zêdetir dike û li dijî Qadên Berxwedanê tevî çekên giran , çekên kîmyawî jî bikar tîne. Ji bo qirkirina gelê Kurd çi ji destê wê tê, dike.
Piştî têkçûna DAIŞ'ê li bakur û rojhilatê Sûriyê, dewleta tirkî ya dagîrker êrişan xwe yên ser herêmê zêde kirin. Dagîrkerî bi balafirên bêmirov, tang û topan êriş dike û gelek komkujiyan jî pêk tîn e.



**Hin êrîşên dagirkeriyê yên 2023'an yên ser Rojava wiha ne:**

1'ê Çileyê 2023'ê artêşa Tirk a dagirker nuqteyek hêzên hikumeta Şamê li gundê Elqemiyê yê navçeya Şera ya Efrîna dagirkirî topbaran kir.di encama topbaranê de 6 endamên hêzên hikumeta Şamê birîndar bûne.
3'ê Çile balafireke bêmirov a dewleta Tirk a dagirker gundê Til Tewîl ê Hesekê bombebaran kir, di encamê de zirarên madî çêbûn.
7'ê Çile Di êrişa balafireke bêmirov a dewleta Tirk a dagirker a li ser gundê Xalidiyê yê Eyn Îsayê de zarokek birîndar bû.
19'ê Çileyê de balafirek bêmirov û biçek a artêşa Tirk a dagirker nuqteya Têkiliyên Leşkerî ya li bajarokê Rimêlanê kir armanc û di êrişê de şervanekî QSD'ê şehîd bû û şervanek jî birîndar bû.
16'ê Sibatê de di topbaran dewleta Tirk a dagirker li ser navçeya Til Rifetê de welatiyekî 70 salî şehîd bû.
1'ê Adarê de di topbarana dewleta Tirk a dagirker a li dijî navçeya Eyn Îsayê de, şervanekî QSD'ê şehîd bûye.
Dewleta Tirk ya dagirker di 14'ê Nîsana 2022'yan de li hemberî gerîlayên PKK'ê li Zap, Metîna û Avaşînê dest bi êrişeke nû ya qirkirinê kir. Gerîlayên azadiyê jî bi vîn û baweriyeke mezin li hemberî dagirkeriya dewleta Tirk, berxwedaneke dîrokî dimeşînin. Artêşa Tirk, ruxmê ku teknîka herî pêşketî a cîhanê li hemberî gerîla bikar tîne jî, nikare îradeya gerîlayan bişikîne. Berevajî armancên xwe, artêşa Tirk li hember berxwedana gerîla, li ber têkçûnê ye. Dewleta Tirk ya dagirker ji bo rê li ber vê têkçûnê bigire, li gel teknîka bilind her cûre çekên qedexekirî û çekên kimyewî bikar tîne.

**Hin êrîşên kîmyawî yên dagirkeriya Tirk yên 2023'an**

1'ê Çileyê li nêzî qada Çemço ya nehiya Şêladizê ya navçeya Amediyê, artêşa dagirker ya Tirk çeperên berxwedanê carekê bi bombeyên qedexekirî hatin bombekirin.
3'ê Çile artêşa Tirk a dagirker li herêma Çemçoyê 13 caran bi çekên kîmyewî bombe li qadên berxwedanê yên gerîla barand.
4 û 5'ê Çileyê Qadên Berxwedanê yên Girê FM, Girê Cûdî û Girê Biharê, çeperên bexwedanê yên gerîla yên li nêzî gundê Sîda û qada Çemçoyê yên li nehiya Şêladizê ya navçeya Amêdiyê bi dehan
caran bi obus, tank û çekên giran bombebaran kirin.
14'ê Çile Artêşa Tirk a dagirker 11 caran bi çekên kîmyewî, 2 caran bi balafirên şer û bi dehan caran bi obus, tank, hawan û çekên giran bombe li çeperên berxwedanê yên gerîla barand.
18'ê Çileyê çeperên berxwedanê yên gerîlayan ên nêzî herêma Çemço ya girêdayî navçeya Şêladizê ya Amêdiyê ji sibehê heta şevê 11 caran bi çekên kîmyewî hatin bombekirin.
29 û 30'ê Çileyê de çeperên berxwedanê yên gerîla yên li derdora herêma Çemço ya girêdayî navçeya Şêladizê ya Amêdiyê du caran bi bombeyên qedexekirî hatin bombekirin.
18'ê Sibatê li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî, li nêzî gundê Sîda û qada Çemço yên ser bi nehiya Şeladizê ya navçeya Amediyê çeperên berxwedanê bi obus, tank û çekên giran 63 caran hatin bombekirin.
20'ê Sibatê li nehiya Şêladizê ya navçeya Amediyê, çeperên berxwedanê yên li nêzî gundê Sîda û qada Çemçoyê, bi bombeyên teqezekirî û topên ji fosforê 23 caran hatin bombekirin.
12 'ê Adarê Artêşa Tirk a dagirker qadên berxwedanê 10 caran bi balafiran, 36 caran bi helîkopterên êrîşê, obus, tank û çekên giran bombe kirin.
18'ê Adarê çeperên berxwedanê yên li Çemçoyê carekê bi çekên qedexekirî hatin bombekirin.
Hêjayî gotinê ku şandeya IPPNW'ê di 20-27'ê Îlona borî de serdana Başûrê Kurdistanê kiribû û ragihand ku wê gelek delîl li ser bikaranîna çekên kîmyewî ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve bi dest xistine. Her wiha şandeyê diyar kir ku Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) xebatên lêpirsînê û hevdîtina bi mexdûrên êrişên kîmyewî re, asteng kirin.

### DEWLETA TİRK GEFÊN Lİ SER HERÊMÊ DİDOMÎNE



**Zekî BEDRAN**

Dewleta Tirk di 7'ê Nîsanê de balefirgeha navnetewî ya Silêmaniyê bombebaran kir. Berpirsyarên DYE yê diyar kirin ku hêzên wan ên leşkerî jî hatine armancgirtin. Tirkiye vê cesareta bêsînor ji ku digre? Bersiva van pirsan girîng e. Lingê herêmî yê vê êrîşkariyê PDK ye. PDK bi salane hewldanên dagirkeriya dewleta Tirk rewa dike û bi wî re tam di nava kordîneyekê de tevger dike. Ji derve jî Tirkiye bi piştgiriya DYE û NATO'yê hat sirtikîkirin. Her çi kir li cem wî kar ma. Welatên Ereb jî, li hemberî êrişên Tirkiyê yên li ser Iraq û Sûriyê yan bêdeng man an jî bêelqe man.
Tirkiyê, di wateyek rast de Sûriye wêran kir û xiste nava şerekî navxweyî yê xwînrij. Herêmên pîşesazî yên Helebê, bermahiyên dîrokî yên Sûriyê, heta di ser DAIŞ'ê re petrol û hema her tiştê Sûriyê talan kir. Bi vê re sînordar nema, DAIŞ û El- Nûsra jî di nav de piştgirî da tevahî hêzan, hevpar tevger kir. Yên ji ber van çeteyan mayî û bihezaran kes bi çek kir. Ev çete di bin navê Artêşa Netewî ya Sûriyê de kom kir û ji bo hilweşandina hikumeta Şamê amede kir. Dema ku Efrîn û herêmên din dagir kir ev çeteyên çekdar da pêş, weke piyon bikar anî. Tu xirabî û sûc nema ku nekir.
Piştî ku Erdogan nekarî Şamê bigre û hikumetê hilweşîne, niha jî dibêje em hevdîtinan çêbikin. Rûsya di vî karî de xwe daye ber sponsoriyê. Erdogan ji bo hevdîtinê hewl dide, lê ne ji bo qenciyê. Dixwaze bi Şamê re bibe yek û Kurdan ji herêmê derbixe û herêmên xweser ji hev belav bike. Yanî dixwaze xirabiyên nû li xirabiyên xwe zêde bike. Kesê ku aştiyê dixwaze, destpêkê dawî li dagirkeriyê tîne. Divê destê xwe ji nava Sûriyê bikişîne. Heta niha tu kesî gotinek dê xwe ji Sûriyê vekişînin ji devê tu berpirsyarên Tirkiyê nebihîstiye. Gef li welatên Ereb dixwar. Niha dixwaze navbera xwe û wan xweş bike, heta hewl dide ji Erebîstan û Yekîtiya Emîrên Ereb piştgiriya aborî bistîne. Van tiştan tevahî ji bo ku di hindir de teng bûye û carek din bibe desthilat ji bo hilbijartinê dike.
Dewletên Ereb jî bi hevgirtî nêz nabin. Nabêjin ku heta Erdogan dawî li dagirkeriya li Iraq û Sûriyê neyîne, dê têkiliyên me asayî nebin. Erdogan jî bikaranîna hêzê re xwe li herêmê bi cih kir û li Sûriyê û Iraqê bû xwedî gotin û bandor e. Ji ber vê, niha jî Silêmaniyê bombebaran dike û dike hedef. Gelo welatên Ereb çima Yekîtiya Erebî ava kirin, di rewşa heyî de ev pir bêwate bûye. Tirkiyê bi hezaran leşkerên xwe li axa Iraq û Sûriyê bi cih kiriye. Qadên berfireh dagir kiriye û li van herêman bi dilê xwe tevdigere. Iraq û Sûriyê endamê Yekîtiya Erebî ne. Eger Yekîtiya Ereb li hemberî dagirkirina axa endamên xwe bêdeng bimîne û bi dagirker re têkiliyek asayî çêbike, wê demê ev yekîtî kêrî çi tê? Ev yekîtî çima hatiye avakirin, divê ev pirs bê lêpirsîn.
Dewleta Tirk balefirgeha ku Mazlûm Ebdî û DYE yî lê bûn bombebaran kir. Ev di aliyekî de gef û êrişa li ser YNK'ê ye. Dixwazin deriyê Silêmaniyê jî weke Hewlêrê li QSD û Kurdên Bakur bigirin. Tirkiyê, li Silêmaniyê hinek bûyerên kuştinê ku jin jî di nav de bûn pêk anî. Peyam dide, dibêje eger tiştên dixwazim nekî û serî li ber min netewînî, hêza min heye ez ê te jî biperçiqînim.
Mazlûm Ebdî jî ji sala 2011'an ve li Sûriyê li dijî DAIŞ'ê şer dike. Di şerê Koalîsyonê yên li dijî DAIŞ'ê de, pêşengiya hêzê kir. QSD'ê deh hezar şehîd da û di binxistina DAIŞ'ê de rolek bingehîn lîst. Di rastiyê de ev şer bi navê gelên cîhanê hat kirin. DAIŞ'ê ji bo tevahî gelan gefek bû. Demekê Tirkiyê pişta xwe da DAIŞ'ê û xwest Kurdan bifetisîne. Piştî ku DAIŞ têk çû, bi xwe bi awayek vekirî êriş kir. Mazlûm Ebdî, li dijî Tirkiyê tu şer îlan nekiriye. Ji sala 2014'an ve bi DYE û Koalîsyonê re hevkar dixebite. Gelo Tirkiye, çima li dijî kesek ku evqas xizmeta mirovahiyê kiriye dijminahiyek bêsînor dike û hedef digre? Mijara esasî ku divê cîhan lêpirsîn bike ev e.
Tirkiye her roj gefan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dixwe. Lê gef û êrîşên wî bi vê re sînordar nema, hedefa xwe ji Şengalê heta Silêmaniyê berfireh kiriye. Mixabin, PDK jî dibe hevkarê gef û qirkirina li ser Kurdan tê meşandine. Eger êrîşên li Silêmaniyê ji PDK'ê qut bê destgirtin, dê rastî neyên fêmkirin. Kujerên kuştinên ku li wir çêdibin hemû reviyan Hewlêrê. Kujer li Hewlêrê xwe di ewlehiyê de dibînin. Eger PDK'ê li şûna alîkariya bi kujeran re, kujer girtibûya îro êrişa li dijî balefirgeha Silêmaniyê çênedibû. Eger ev bûyer ji PDK'ê qut bên destgirtin, dê bibe safîtî. Ji xwe di daxuyaniyên bi navê PDK'ê hatin kirin de jî, li şûna dewleta Tirk, PKK û QSD hatin sûcdarkirin. Ev bi salane di êrîşên li ser Şengal û gerîlayan de jî, PDK'ê dewleta Tirk paqij da nîşan. Sedemê êrîşan bi hebûna PKK'ê ve girê da. Di hilbijartinên li Tirkiyê de jî, PDK li cem Erdogan cih digre. Di rastiyê de PDK aliyê xwe zelaltir dike.